

Diyardeyeke erênî pêwîst e kûr bibe

Bûyerên heleqeya lêkolînî derbarê hizr û kêşeyên tevgera netewî rizgarîxwaza kurdî rengek ji hewildanên lêvegereke-şermîn-weke xwerexneyeke ne eşkere ji aliyê nûnerên hindek şepolên netewî yên beşdar, bi taybetî ji aliyê du rêbazên cida û dijber ku semyana tundrewiyê bi xwe digirin:şepola netewiya tundrew û şepola–nîştimanî-antî-nasiyonal ya nêzîk ji tevgerên ku dûr ji semyana netewî kar dikin.Her weha, tevî sinordariya populerî û serdestiya herdû şepolên navhatî di navendên çandî û siyasî di kurdistanê de, dîsa bala ravekaran kişand ku nûnerên wan di vê heleqeyê de, û bê rêkxistin her yek ji aliyê xweve, lihevkirinek bi şepola netewiya demokratîk re dane nîşandan.Ev bi xwe pêşveçûneke di bîreweriya netewî ya kurdî de.Ji aliyekî din ve, nêrîneke hevbeş derbarê jêderên hizra netewî kurdî û pêvajoyên pêşveçûn û sedemên qelsiya wê , hate holê.

Divê bê gotin ku, pêşveçûna şêwaza danûsitendina demokratîk derbarê pirsên di nîgaşê de di navbera panelîstan de û rêzgirina hevûdu, taybetmendiyeke din ya heleqeyê bû.Her weha, arezûya bihêz li nik kadroyên tevgera rizgarîxwaza neteweyî nexasime nifşê nuh derbarê guftûgo û nîgaş û tihniya wan ya rewşenbîrî ji doz û hizra tevgera netewî rizgarîxwaza kurdî re.Di heman çarçoveyê de, helwesteke demokratîka yekgirtî sebaretî parastina ezmûna Kurdistana/Iraqê û pêkanîna erkên wê yên aborî û civakî û neteweyî û piştgirîkirina wê di warê çareserkirina pirsgirêkên neteweyên kurdistanî li gor ku di destûra herêm de hatiye çesipandin, di guftûgoyê de hate xuyakirin.

Ji aliyekî din ve, hevkariya di navbera serokatiya zanîngeha Selahedînê û Kombenda Kawa bo Çanda Kurdî, di girêdana heleqeya lêkolînî sebaret bi hizr û kêşeyên tevgera neteweyî rizgarîxwaza kurdî ciyê rizamendiya beşdaran bû.Her weha, wan daxwza berdewamiya karê hebveş di nabvera tavilê dezgehên rewşenbîrî di herêmê de kirin, bi taybetî di derbarê pirsgirêkên kurdistanî yên giştî de.Tevî ku bê guman, hindek kêmasî hebûn, lê dikarin di paşerojê de bêne çareserkirin.

Di dawiyê de, divê bê gotin ku-tevî hemû erêniyan-hişmendiya neteweyî li nik kadro û ronakbîrên tevgera neteweyî ya kurdî lawaz e di gel nebûna bîrdoz û zaniyaran di hemî biwarên dîrokî û siyasî û çandî, evên ku di qonaxa îroyîn de, here pêwîst in.